
Dr.Nûredîn Zaza
1919 - 1988

# NEWROZ


Osman Sebrî
1905 - 1993

*Xebat ji bo* :
* **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
* **Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 125)* *Sal 21* *Mijdar - Berfenbar 2016 z - 2628 k* *Buha (75)L.S*


# Hêviyên Gelê Sûrî! ... Û Saleke Nû!

## Desteya sernivîser

Sal rûpel in û mirov jî nivîskar e. Geh mirov tiştê baş dike, jiyana xwe pêşde dide û rûpelên dîrokê geş dike, geh jî tiştên xirab û çepel dike, rûpelên dîrokê reş dike, û jiyanê wêran dike. Ango li dirêjiya sal û serdeman, herdem rindî û nerindî, mirovatî û hovîtî, setem û dadmendî, reş û sipî, xêr û şer raberî hev dibin, û wilo dem tol dibe û dîrok tê nivîsandin.

Sala 2016an jî deriyê xwe girt û rûpela xwe da hev. Û saleke nû deriyê xwe vekir û pênûs û lênûsa xwe amade kir.



Li dawiya her salekê, mirov karûbarên sala xwe dide ber çavan, kar û zirara xwe dibîve, û doza saleke nû ye bi xêr û rindtir dike.

Gel û dewlet jî wiha ne, ew jî sala ku borî dinirxînin, wan û serpêhatiyan jê digirin, û li ber roniya wê, paşerojeke geş hêvî dikin û ji ber ve dixebitin.

Ji maf û erka gelê Sûryê jî, li rewşa xwe vegere, lê binêre, ku piştî pênc salan ji şerê navxweyî, ku hinek wî bi şoreş ………. 2

## Şewata Sînema Amûdê Birîneke hîn ne hatiye hev

### Mihemed zekî Mihemed

Li roja 13 – 11 – 2016an, emê (56) mûman li ser Girê Şermola vêxînin, da ku em gorên zarokên xwe yên ku bê sûc û guneh bi agirê Sînema malmîrat hatin sotin, ronî bikin û ji wan re bêjin, ev roniya azadiyê ye, îro çirûska wê li Amûdê vedide, û bê guman e, wê li …………..7

## Nameya pîrozbahiyê

**Endamên kongreya navçeya KOBANÊ ya (PYDKS)**

**Mêvanên birêz...**

Bi boneya girêdana kongreya navçeya we di van merc û hoyên taybet de. …………..3



## Pirsa Kurdî li Perlemana Ewrupî

Li ser xwesteka grûpa parlementerên(Partiya Keskan û Sosyalistên Demokrat) ji bo gengeşekirina pirsa Kurdî Li Tirkiyê û Rojhilatê, bi beşdariya gelek parlementer, siyasetmedar û pisporên mezin ên Ewropayê, roja 07.12.2016an, li holeke avahiya parlementoya Ewropî/ Biroksel ê, konferenseke piştgîriyê hate lidarxistin. Di vê konferensê de, girtin û zindankirina ……..……...7

# Gel Li Benda Lihevkirinê Ye!

Wekî ku xuya dibe, asta nakokiyê di navbera partiyên kurdî de li ciyê xwe ye.

Eger mera bi çavekî bêlane li wan nakokiyan û sedemên wan binêre, û bala xwe bidê, mera dê kani be bêje, ku sûc û sedemên wan nakokiyan gelek in.

Gerek e ji bîra me neçe, ku ev rewş û pirsgirêkên ne durust, derfetên zêrîn ji neyarên gelê me re tînin meydanê, û dilxwaziya pêkanîna armancên wan ên çepel pêk tînin; ne tenê wilo, beşekî mezin ji xelkê me û raya giştî jî, êdî di ber xwe de dipeyîve û



dibêje: Dema ku metirsiyên rêxistinên têror li ser gelê Kurd kêm bû, em bixwe bixwe radibin hev, û dijmin jî fersendê dibîmçne ku destê xwe dirêj nav me bike, û hewilde ku destkeftiyên kurdan ji hundir de û bi destê wan têk bibe.

Roja îro pêdvî û daxwazeke gelêrî ye giring heye, ku hevpeyvînên sûdar li ser bingeha parastina berjewendiyê gelê Kurd li dar bikevin, û partiyên kurdên Sûryê, di nava wan de Hevbendiya Niştimanî a Kurdî jî, bi erkên xwe yên netewî rabin, daku heviya gelê Kurd bi serkeftin û bidestxistina mafên xwe bilindtir bibe. Çinkî em baş zanin, ew dewletên ku îro bi çavekî erênî li doza me dinêrin, çi Emerîka û Rûsya û çi bilî wan jî, ne evîndarên çavên me ên reş in; eger em li hev nekin, ewê me li şûna xwe bihêlin.

---

**Hêviyên Gelê … Dûmahîk** bi nav dikin, çi kiriye, gihîştiye kîjan rewşê, û di çi deraqî de ye.

Hema bi kurtahî, li gora serhejmarên ne fermî, di van pênc salan de, dora nîv milyon kes ji gelê sûrî hatiye kuştin, û bêtirî sê milyonan jî birîndar bûne, ango bi qaserî jimara gelê dewleteke mîna Libnanê.

Ji aliyê avahiyan ve, dora % 40 ji avahiyan, çi mal û çi avahiyên tevahî, yan serûber wêran bûne, yan jî bi kêrî rûniştin û bikaranînê ne tên.

Di hêla aborî de, %80 ji aboriya Sûryê hatiye herifandin û dora 200 milyar dolar gerek e ku rabe ser lingên xwe.

Ji hêla civakî ve, tîş û perçebûnên pir mezin ketin navbera dever, ol û pêkhateyên sûrî, û ewê haldeman jî ne tên dermankirin.

Ji aliyên ewlehî û jiyanê ve jî, ciyê her buveh û dijwar li cîhanê Sûryê ye.

**Ji aliyê mirov û mirovahiyê ve jî:** Li gora serhejmarên ``Nivîsgeha Yekîtiya Netewan Bo Hevsazkirina Karûbarên Mirovahiyê``:

- 2.8 milyon mirovên sûrî bûne kêmendamên herdemî.

- Her mihekê, 30 hezar mirovên Sûrî, ji ber şerûpevçûnê ve toşî êşgihandineke derûnî dibin.

- 2.9 milyon zarokên di bin pênc saliyê re, di nava şerûpevçûna ku li welêt dibe de hatine jiyanê.

- Heft milyon zarokên xizan hene.

- Milyonek û heftê û pênc hezr zarok ji xwendinê bêpar mane.

- 13.5 mirovên sûrî bi pêdviya alîkariyê ne, jê pênc milyon zarok in.

- Milyonek kes di bin dorpêçkirinê de ne.

- 3.9 kes gihîştina bo wan û deverên wan dijwar e.

- 6.3 milyon kes neçar bûne ku warên xwe berdin û herin li deverine din ji Sûryê bi cih bibin.

- 4.3 milyon kes pêdviya wan bi malekê heye.

Hege em li van serhejmaran binêrin, emê bibînin û nas bikin, ku gelê sûrî û Kurd jî di nav de, dê bi çi rewşê û bi çi hêviyan derbas sala 2-17an bibe.

Lewre jî, roja îro, her mirovekî sûrî ku dilê xwe li ser welatê xwe ye, hêvî dike û dilxwaze, ku rojekê pêşde ev şerê ku ter û hişk dayê ber xwe, raweste, hêminî li welêt peyda bibe, xelk li warên xwe vegere, birînên xwe derman bike, û di siya sazûmaneke dadmend de, ji nû ve dest bi avakirina welat û civaka xwe ya birîndar û wêrankirî bike. Em hêviyan nabirin û ji xebat û têkoşîna xwe namînin.

**Hûn bimînin di xweşiyê de.**

# Gelo serkirdeyên partiya "AKPê" ... Berê Tirkiyê dane teqanê?!

**Newafê Bişar**

Piştî serkeftina gelê Kurd a aştiyane di hilbijartinên parlementoya Tirkiyê de, siyasetmedar, berpirsên şoven û dezgehên ewlehiya dewleta kûr a Tirkiyê veciniqîn, dîn û har bûn, mîna ew kesê ku xwînê bi xwe ve bibîne!... Çawa Kurd bi serê xwe, li gora berjewendiyên xwe biramin, tevbigerin û ew ji diruşmên mîna (Yek dewlet, yek al, û yek ziman...) dûr bikevin!!?.

Bi encama vê ezmûnê, ew têgihiştin ku di merc û hoyên aştiyane de, bi nizimbûna dengê qurşîn û guleyan, dengê aqilmendî, hevrejiyan û aştiyê bilind dibe, rê li pêş ramanên reş, kîna kor, nijadperestî û zikreşiyê têne girtin. Pilanên pişaftin û windakirina glê Kurd li ber tavê aşkere xuya dibin. Vêca yekser, bi behanene pûç, prosêsa aştiyê ji bo çareseriya doza Kurdî rawestandin û fermana nûkirina şer li dijî PKK wergirtin. Balefirên cengî yên dewletê, bombeyên giran bi ser gund û bajarên Kurdan de barandin, ew bi top û cebirxaneyan gulebaran kirin, û careke din termên kuştiyan ji her du aliyan bi ser kes û xelkên wan de hatin şandin, û Tirkiyê vegerandin demên şer û mirina reş...!

AKP bi armanca ku sazûmama rijîma serokatî cîbecî bibe û tevaya desthilatê di destê serokomar de be, û dengê rikberiyê bibire, rabû digel hin hevparên xwe bûyera derbeya 15ê Tîrmehê ji xwe re bi kar anîn, û bi behaneya wê, bi deh hizaran efser, leşker, siyasetmedar, rewşenbîrên xweser, dadger û pisporên ragihandina azad ji kar dûr xistin, zindan kirin. Bi van kiryarên xwe yên ji yasayê der, wan baskên rikberiyê birîn, mafê nerîn û derberînê binpê kirin, tirseke mezin xistin dilên xelkê, û berê welêt dane paşerojeke tarî û çarenûseke ne diyar.

Da ku çavên gelê Kurd û xebatkarên wî yên rêzanî bi yek carê bişkînin, vîna wî ji bo bidestxistina maf û azadiyan têk bibin, hêrişên çekdarî li hember xebata wî ya aştiyane daxistin meydanê, li pêla hin şaşiyên Kurdan siwar bûn, yên mîna kolana xendekan di hin bajaran de, gelek gund û taxên bajarên mîna Diyar bekirê, Nisêbînê, Şernexê û...hwd, wêran kirin, bi sedan




kes kuştin, birîndar kirin, û bi hizaran jî welatî zindan kirin. Herweha, û da ku tevgera Kurdî bitirsînin, bişelînin, roja Înê 04.11.2016an, dezgehên ewlehiya dewletê hevserokatiya Partiya Gelan a Demokratîk(HDP) digel hin endamên rêveberiyê zindan kirin. Paşê, xebatkarê Kurd ê navdar, birêz Ehmed Turk/ serokê şaredariya Mêrdînê jî binçav kirin, ku ta roja îro, bê sûc û bê guneh ew hemû girtî ne... Ew kiryarên hikûmeta AKP û dewleta Tirk yên li dijî zagon û mafên mirovan hatin kirin, ji bal piraniya dewletên cîhanê ve bûn cîgehê rûreşî û şermezariyê.

Lê, wekî her kes jî dizane ku dozên gelan bi girtin, lêdan û kuştinê çareser nabin, berovajî wê, ew gurtir û xurtir dibin, gelê Kurd jî li ser rêya kar û xebata xwe ya dadmend û rewa her berdewam e.

---

**Nameya pîroz … Dûmahîk**

Weşana we ya bi zimanê Kurdî NEWROZ we pîroz dike, hêviya serkeftinê ji kar û barên kongreya we re dike.

**Xwişk û birayên beşdar...**

Bi saya kar û xebata gelek rewşenbîrên me yên zîrek ên mîna lawê Kobanê, gorbihuşt Mustefa Ellaş û pakrewanê raman û pênûsê Kemal Henan ku bi sedan keç û lawên gelê me li deverên Kobanê û Efrînê li ser destên wan fêrî xwendin û nivîsandina zimaê dayika xwe bûne, ku her du endamên desteya sernivîser a Newrozê bûn. Her weha, bi piştgirî û alîkariya gelek rewşenbîr û nivîskarên me yên dilsoz, hê jî Newroz, li kêleka we, li ser rêya geşkirina çand û gotara lihevkirin, hezkirin, yekîtiya Kurdan, û rûreşkirina çanda zikreşî û berberiyê di nava civaka me de berdewam e.

Careke din, em serkeftinê ji kongreya we û doza gelê Kurd re hêvî dikin.

**Weşan NEWROZ** 20.12.2016

# " Berî her tiştî, bibin yek, paşê hay ji zimanê xwe hebin, lê xwedî derkevin.!."

## Hevpeyvîn bi xebatkarê Kurd Ehmedê Asîno re



*Bi saya kar û xebata têkoşerên Kurd ên dilsoz, ewên ku di dema tirsê de, dema reş û tariyê de barê Kurdewariyê hilgitibûn ser milên xwe û ji bo azadî û bexteweriya gelê xwe yê bindest zend û bendên xwe vemaltine, ala xebata aştiyane hildane jor û dane ser rêya dijwar a tev rêl û kelem, ku gelek westan û azarên bi êş li ser dîtine, xewa şevan li wan çûye, birçî razane. Di zivistanên sar û keklkela germa havînan de,li malên xwe ne hêwirîne... Bi saya wan comerdan, îro gelê me yê Kurd li Sûriyê xwe bi ziman, nijad û kultûra xwe payebilind dibîne. Yek ji wan xbatkaran jî, apê me, heval **Ehmedê Asîno**, ji gundê Babasiyê ye.*

*Wefadarî ji xebata demdirêj a vî xweşmêrî re, weşana we NEWROZ, li gundê Babasiyê lê bû mêvan û ev hevpeyvîn pê re kir:*

***1-Li destpêkê, em bi hêvî ne ku tu xwe ji xwendevanê Newrozê re bidî naskirin?.***

B:Navê min Ehmedê Asîno, ji gundê Babasiyê me, temenê min 89 sal e. Li gundê Xirabê reş ji dayik bûme. Paşê, mala Haco Axa gundê Babasiyê dabûne kuramê min ê bihuştî Hecî Hesen. Em çend malên ku kuramên hev in lê dijîn. Dema em hatibûne vî gundî, temenê min dora 10-12 salî bû.

***2- Dema te dest bi siyasetê kir û tevlî rêzên rêxistinê bûyî, temenê te çend sal bû?.***

B:Berî ku ez hevjîna xwe biguhêzim, temenê min nêzîkî 20 salî bû, rojekê, Sebriyê Hecî Hesen ê ku li bajarê Helebê dixwend, hate mala me û ji min re got:" Nêzîk, dê partiyeke Kurdî were damezrandin. Ji bo tu tevlî wê rêxistinê bibî û em komikekê saz bikin, pêwist e tu du-sê hevalan ji xwe re bibînî. Ev partî ji bo kurdan û serxwebûna Kurdistanê ava bûye".

Min Têkilî bi Xelef ê Xelîl û Hisênê Hemedê ji Babasiyê re kir, ewan ji bo tevlîbûna partiyê erê kirin û li benda min man. Piştî demekê, Sebrî ji min pirsî: " Ka, te çi kir, çi bi te re çê bû?". Min jê re got: "Tenê em sê nefer in, navên me jî ev in...". Piştî çend rojan, wî ji min xwest ku filan rojê, bi şev, ne bi hev re û her her yek di cihekî cuda re, em herin gundê Maşoqê. Û got: Berî hûn bighin gundê Maşoqê, dê zilamek bê pêşwaziya we bike, we bibîne. Ew ê ji we re bipeyive, ew berpirsiyarê we ye". Em gihane cihê soza xwe, mirovek hat pêşiya me û got: " Bê guman, hûn hevalên me yên nû ne?". Me got: Belê. Rabû wî jî xwe bi me da naskirin. Ew, Fayiqê mala Ebdirehmanê Unis axa bû....Bi dirêjî ew ji me re li ser Qadî Mihemed, Şêx Se`îd û şoreşa Seydayê Mele Mistefayê Bezanî peyivî. Herweha wî ji me re diyar kir, ku kurdayetî çi ye û çi ji me tê xwestin.. Li dawiyê, wî ji me xwest ku her yek ji me navekî nehênî li xwe bike.

Piştî demekê, li sala 1957an, ji me re rêkirin ku ji bo pîrozkirina cejna Newrozê divê em herin gundê Maşoqê civînê bikin. Her du hevalên min ne berdest bûn. Rabû, ez û Hecî Selîm bi hev re çûn gundê Maşoqê. Gelek kes hatibûn, li ser newrozê û kar û xebata partiyê ji beşdaran re peyivîn. Li dawiyê, gotin ku du xwîşk wê helbestina ji we re pêşkêş bikin. Du qîz hatin, milên xwe dane hev û helbesta Seydayê Cegerxwîn (Herne pêş ) ji me re gotin:

***Birayên delal win werin kurdino***

***buhişta welat em herin merdino***

***eger win neyên vane keç em meşîn***

***bes e koletî serfiraz her bijîn...***

Bi rastî, wê ahenga xweş bandoreke mezin li min .......

5

**Hevpeyvîn bi .... Dûmahîk**

kir û li ber dilê min gelek xweş bû.

***P3: We çilo karê xwe dikir?***

B: Me têkilî bi xelkê re dikir, ji wan re li ser kurdayetiyê û pêwîstiya kar, û da em jî weke miletên cîhanê azad bijîn, di welatê xwe Kurdistan de serfiraz bijîn, em dipeyivîn. Kar jî di wê demê de zor û zehmet bû, lê me berdewam dikir.

***P4: Kongirekî PARTÎ li gundê we hate lidar xistin, çilo gundê we Babaiyês hate bijartin?.***

B: Rojekê, bihuştî Xaldê Meranî ji Maşoqê û Hecî Mihemedê Botî ji Qetraniya Seyidan hatin mala me. Wan ji me re dane xuyakirin ku ev e demeke ew dipirsin ku kesek xwe bide ber cihê girêdana kongirê PARTÎ, hîna tu kesî xwe nedaye ber. Hema yekser û bê dudilî min got: "Mala min li ber we ye, bila li mala min bê girêdan"...Piştî çend rojan, posteke mala Sebriyê Eliyê Ehmed hebû, bi şev ew û turimbêlin din hatine gund, nezîkî 80 kesî ji wan peya bûn - ew endamên kongir bûn- berê xwe dane mala me, rûniştin û kongir li dar xistin. Kongirê Partî yê diwem li sala1977an, sê rojan berdewam kir. Ez bi xwe ne endamê kongir bûm lê min dergevaniya hevalan şev û roj dikir. Wan hevalan, gelek xwarin jî bi xwe re anîbûn. Lê, min û mamên xwe jî sê mih ji wan re gurandin, kirin firavîn.

***P5: Çi balkêş di wî kongirî de tê bîra te?***

B: Mîna berî niha jî min got ez ne endamê kongir bûm, lê di dawî de dema daxuyana xwe amade dikirin, silav ji şoreş û welatên piştgirên gelên bindest re rêkirin. Ji min re gotin: "Navê şoreşa Mele Mistefa Berzanî di nav wan de nîn e, hema di cih de ez rabûm û hatim nav wan û bi tinazî min ji wan re got: " bawer bikin ku navê Berzanî neyê nivîsandin, ezê we tevan bi vê kilaşinkofê bikujim"..Keniyan û gotin:"Na, na..Wê weke te bibe".

***P6: Ji bîranîn te yên balkêş di karê te de tê çi ji xwendevanan re dibêjî?.***

B. Yekem, ji xwe girêdana Kongir li mala min, di wê dema ku gelekan xwe ne didane ber, çimkî rewşa ewlekariyê gelek zor û xerab bû. Diwem, Êzgeha Şoreşa Kurdistana başûr hate mala min , xortek ji (KOK) ê Kurdistana Bakur, navê wî Mistefa bû ji min re got: " xwe amade bikin, îşev wê karwanek di navbera Girdêmê Banî û Til Xatûnkê re derbas bibe here Bakurê Kurdistanê, divê em vê êzgehê derbasî Tirkiyê bikin. Em gihane cih, karwan jî gelek mezin bû. Mehmûdê Yihya ji gundê Dêrûna Axê jî bi me re bû. Ji nişkave, Mehmûd got:" Ehmedo xwe xilas bikin, dengê fîşekan ji pêş ve tê". em bi paş de vegeran, êzgeh bi me re, em çûne gundê Girdêm. Me ew di nav hesinê patoza (derasa) mala Sebrî de veşart. Paşê, ew ji wir birin, derbas kirin bakurê Krdistanê.

Piştî têkçûna şoreşê sala 1975an, û vejîna wê careke din, ew hewcedarî çek û fîşekan bû. Hesenê Eliyê Ehmed gote min: "Ehmed, gelek çek hatine, divê em wan çekan bi hêstiran bigihênin gundê Xirbebilika, li wir, pêşmerge li hêviya me ne, em ê bar radestî wan bikin. Me ji Remê Hecî Mirad -ew jî gundîkî me ye- xwest ku alîkariya me bike, ew camêr bi me re hat, me barê çekan li 40 hêstirî kirin û gihandine gundê Xirbebilik

***P7: Kengî te gorbihuşt Ismayil Umer nas kir?***

B: Di kar û xebata partî de, em bi hev re bûn, min û wî gelek ji hev hez dikir. Hinga nakokî di partî de peyada bûn, min aliyê mamoste Ismayil girt. Dema ku ew derbasî herêmê dibû, teqez wî seredana min dikir.

***P8: Tu rewşa partiyên kurdî û xebatê çawa dibînî?***

B:Mixabin ku îro roj, her partiyek xwe tenê dibîne, ev yeka han ne baş e..! Gerek e ji bo doza gelê xwe, em dev ji ezîtiya partiyane berdin, hemû destên xwe bidin hev, li hember xêrnexwazan, yek dest bin, nemaze di vê qonaxa ku welat û miletê me tê re derbas dibe. Ez dibêjim: "yekîtî , yekîtî.. " ew e ya ku hêzê dide me, me ji êrîş û kîna neyaran diparêze.!

***P9: Tu hatiyî girtin, an dezgehên ewlehiya dewletê lêkolîn bi t re kirine ?***

B: Girtin na, ez ne hatime girtin, lê gelek caran ji bal wan dezgehan ve, ez vexwestî lêkolînan bûme.

***P10: Te Nûredîn Zaza û Apo Osman Sebrî dîtibûn?***

B: Belê min her dû jî dîtibûn, bi karê partiyê ew hatine mala min. Gorbihuşt Nûredîn Zaza zû çû ber dilovaniya xwedê. Bi rastî, ew xebatkarine dilsoz û pêlewan bûn.

***P11:Tu çi ji me re dibêjî?***

B: Bila xebata we ji bo gelê we be, û rêya rehmetiyê Ismayil Umer bernedin, li ser berdewam bin.

***P12: Gotina te ya dawî ji xwendevanên Newrozê re çî ye ?***

B: Berî her tiştî, bibin yek, paşê hay ji zimanê xwe hebin, lê xwedî derkevin.!

***Spas ap û hevalê hêja, xwedê temenekî dirêj bide we, her saxlem û bextewer bî.***

Nêrîna Azad

# Li Sûriyê ceng û Şer e

Memê Alan



" Ziyana tund û tûjiyê li Helebê "

Wekî em dizanin, li 15.3.2011an, xelkê Sûriyê ji ber zulim û zora dehsalan, bi awakî aştiyane ji bo azadî û rûmetê serî hilda. Lê mixabin xêrnexwazên vî welatî, di serî de rijîma Be`is û rijîma Turkiyê… Ji ber berjewandiyên xwe yên teng, berê serhildanê dane çekdariyê û di encamê de kanîbûn ling ji bin rêvebiriya bizavê ya kêmezmûn bişimtanda û ji riya rast derxistana; û di karnava wê şimtandinê de, gelek demokrat û aştîxwaz binçavbikirana, bi kuştin bidana yan jî penaber û mişext bikirana.

Wê hîngê tevgera kurdî ser û ber metisiyên xwe ji encamdanên kirêt û bi tirs ji wê rêderxistinê da diyarkirin. Û bi yek dengî got: Em bi şoreşa azadî û rûmetê ya aştiyane re hevkar in, lê tu carî jî nabin hevalê çekaranînê. Çimkî ziyana bikaranîna çekdarkirinê li ser giyanwer û negiyanwer, serzemîn û binzemîna welêt gelekî pir e. Her weha heyam, sîstem û zagonên ceng û şer ji yê şoreşeke aştiyane başqetir, taybetir û çetintir in. Di heyama şer û dogişan de, aramî namîne, guftûgo lawaz dibe, û dem dibe dema çek û çekdaran û rola siyasetmedar, rewşenbîr û hişmendan pir lawaz dibe, û berjewandiyên navdewletî jî li ser wan ferz dike ku ji bo çi çareseriyê be, berê xwe bidin aliyên çekdar û xwedî hêz, û siyasetmedaran jî piştguh bikin. Di şeran de, rewş tevlihev dibe, û dibe ciblaq û ta hêzên çekdar jî bi serê xwe namînin û çi ji wan were xwestin di giştî de neçar in guhdarî yê jê re piştgir bikin, û bi taybetî dema berjewandiyên dewletên mezin dikevin rojevê.

Vêca piştî ku rewş li Sûriyê derbasî qonaxa nakokiyek çekadarî bû, bi hezaran çekdarên biyanî bi navê (cîhad) derbas wê bûn, û destêwerdanên navdewletî ji vir û ji wir tê de çêbûn; Rijîm jî kete tengiyê û xwest barê xwe sivik bike û bi Kurdan re jî nekeve berambertkirineke rûbirû, ji ber wan sedeman rabû ji herêmên kurdî kişî, ev yeka bi xwe rastî berjewendiya me kurdan jî hat.

Ji ber tiştên me li jor anîne zimên û metirsiyên li derdora me çêbûne, Tevgera kurdî neçar ma, ku bi du tiştan mijûl bibe û pêk wine:1-Avakirina hêzeke xweparastinî ji bo ewlekariya herêmên kurdî. 2- Rêvebiriyeke xweser ji bo dagirtina valahiya rêvebirî û xizmetguzarî. Ji ber gelek sedemên hundurî, Kurdistanî û siyastên dagîrkerên Kurdistanê û bi taybetî siyaseta rijîma Turkiyê, tevgera kurdî ya kilasîk ne amede bû, aliyê Tev-Demê xwe jê re hazir kiribû û hêza xweparastinê danîbû, vêca ev aliyê bira, ew hêz bi navê Yekîneyên parastina gel ragihand, di dû re rêvebiriya xweser jî bi navê Kantonên Cezîr, Kobanê û Efrînê da medyayê. Di vî warî de, Tev-Dem li pêş berpirsiyariyeke mezin e.

Şert û mercên li derdora me, çi yên li pêşî me anîne zimên, mîna destêwedanên dewletên derdor, çi jî Rûsiya û Emerîka yên ku serkêşiya doseya kirîza Sûriyê dikin, û lihevnekirina wan li ser pir kêşeyan ji alîkî ve, û ji aliyê din ve metirsiyên rolên îslamî siyasî û bi taybetî rêxistinên mîna DAIŞ û El Nûsra, pir tiştan li ser me hemiyan sepan(ferz) dikin.

# Pirsa Kurdî li Perlemana Ewrupî

B.Dara



….. parlementer û serokên şaredariyên Kurdan hate şermezarkirin û daxwaza rakirina navê rêxistina PKKê ji lîsteya Ewropî ya terorê bû biryar. Encam û biryarên vê konferensê, serî li berpirsên hikûmeta AKPê û serokê wê gêj kirin, ew kirin mîna gurên dev bi xwîn, û her ew di pilan, dek û dolabên xwe yên dijî gelê Kurd û pirsa wî de berdewam in.

Lîstikên vê hikûmetê yên li ser gelek werîsan, têkilî û girêdanên wê bi rêxistinên terorist li Sûrî û Îraqê re bi zelalî hatine eşkerekirin, û ji rikberiya Sûriyê re jî hate xuya kirin ku dewleta Tirkiyê, yek rojekê bi tenê jî neketiye kul û xema rizgarkirina gelê Sûriyê ji sitema rijêma totalîter, û li dawiyê ji bo berjewendiyên xwe, bi erzanî ew firotin...

Hikûmeta AKPê û serokomar R.T Erdoxan bi vê siyaset û van kiryarên xwe, berê Tirkiyê dane teqanê, dibe ku qelenê wê li ser gelên Tirkiyê pir giran be!. Lê, hê jî derfet heye ku ew li xwe vegerin, bi hişmendî biramin, demokrasiyê nûjen bikin, careke din prosêsa aştiyê ji bo çareserkirina pirsa Kurdî nûjen bikin, pêçên xwe ji kirîza Sûrî û Îraqê bikşînin, ji doza Kurdî li Sûriyê netirsin, çiku çareserkirina vê pirsê bi çi awayî dibe bila bibe, ew erk û ustûbarê gelên Sûriyê ye. Eger ew bixwazin welatê xwe ji şer, pevçûn û bobelatan biparêzin, berî her tştî, divê ew doza Kurdî li welatê xwe.

---

**Şewata Sînema ... Dûmahîk**

seranserî sûryê û devera Rojhilata Navîn jî vede.

Azadiya ku di biçûkaniya xwe de, we barê wê hilgirt, win tiyê wê bûn. Bi tenê gunehê we, piştgîriya azdiya gelan bû, tenê win dildarê peyva (AZADÎ) bûn, dildarê hezkirina pêkvejiyana gelan bû, hestên mirovatiyê li cem we berz û bilind bûn, hêviyên we bûn, ku zarokên gelên cîhanê yên mîna gelê Kurd, ji bindestiyê riha bibin, û jiyana zarotiyê bi tore, çand û ziman bidomînin .

Ji loma, we zarokên Amûdê ser û ber, perîşan, belengaz, dewlemend û sêwî …Kertên sînemê birîn, da ku win piştgîriya azadî û rûmetê bikin, we nedizanî ku riya azadiyê bi pîlan û daf e, ta ku agir serê xwe li we hilda, win dorpêç kirin, îdî deriyê mezin nema têra we dikir, hinan ji we xwe di pencerê re avêt, mixabin bîra rûreş li xwarê li benda we bû, ta hawar hawar, bîna kizîra cendekên weyî rexil û nazik bi ser bajêr ket, ta jin kalmêr bi hawara we ve hatin, mêrxasiyeke bê hempa ji bo rihakirina we kirin, mîna Mihemedê Axê, ku bi wêrekî xwe li nav êgir dixist û zarok riha dikirin, dora yanzde zarokan rihakir in, dengek kete guhê wî: Vegere va kurê te riha bû, lê vegerand: Ev hemû zarokên min in, û bi pêşde çû, ta ku demirê hesin yê nava sînemê bi ser de hate xwar, û jiyana xwe ji dest da .

Ev mêrxasî diyar dike, eger ku dilê mirov ser zarokê cîranan nêşe, dê dilê wî li ser zarokê wî jî nêşe.

Bê guman e, ku Amûdê, weke bajar, her dem qelenê qehremanî, kurdperwerî û dilsoziya xwe dide.

Em tev dizanin, Amûdê bû, ku di sala 1937an de bi balafirên firansî hate şewtandin, komela ciwanên kurd li Amûdê bi alîkariya Seydayê Cegerxwîn û hevalên serdema wî hate avakirin, komela alîkariya belengazên Kurd damezrandina wê ji bajarê Amûdê dest pêkir, pişkdariya bajarê Amûdê di serhildana Qamişlo li 2004an û şoreşa sûryê di 2011 ê de berçav û xuya ye.

Tevî van jî, şewata sînemê, birîneke kûr e, hîn nehatiye hev, û daxeke reş e, dê di eniya nijadperistan de bimîne.

# Jinberdan

**Dr. Muhamed Zeyno**
**Almaniya**

Jinberdan wek gotin û peyv ne pir baş tê bihîstin, ev diyardeyeke xira be bi xwe re malwêranî, kîn û nefretan peyda dike. Mirov dizewice ta ku malbatekê ava bike, û berdana jinê beruvajî wê ye; ango malbatê hildiweşînê û hest û nestên mirovan pûç û sist dike. Ev diyardeya di nav hemû civak û gelan de rû dide, her malbatek dikane toşî wê bibe. Lê wek cawa dibêjin... Her yek bi ser miriyê xwe de digrî; her yek ji ber birîn û êşa xwe dinale. Ji ber hindê jinberdan di civaka me de derd û êseke giran e. Giraniya wê êşê ji faktora civakî tê.

Zewaca di navbera du kesan de karaktirekî civakî li ba me distîne. Ew heyamekê di navbera du êl û malbatan de dûz dike. Bi zewacê re 20 - 30 malbat dibin mirovên hev. Heger ew zewac serketî be bi xwe re serketrina gelek malan tînê. Zimanê her aliyekî dibêje.. Çi zavakî me hêja heye, ew ji malvbateke baş e. An jî Çi bûka me hêja ye, ew keça mêraye. Lê dema ew zewac bi serî nebe û bigihê asta berdanê, bi xwe re navê malbatê jî pîs û riswa dike. Û zimanê her aliyekî dibêje... Çi mirovekî pîs bû, an çi jineke xirab bû. Mebest ji vê gotinê ew e ku keç/bûk an xort/zava rûyê malbata xwe ne. Di civaka me de karaktirên civakî şêweyê kolêktîv/komî distîne, mirov li ba me ne bi serê xwe ye, ew di bin çavdêrî û kontirola civakê de ye, ew ne azad e, her karekî û çalakiyekê nikane pê rabe. Mirov li ba me bi tevna civakê hatiye pêçan. Berûvajî welatên Ewropa, li vir têkliyên civakî karatirê tekane/individuê distîne. Mirov di nerîn û helwesta xwe de azad e, li vir mirov pir gih nade kok û esil keçê/xort. Li ba van nav, deng û rengê malbatan ne gelek girîng e. Li vir ya herî sereke ew e, ku herdu aliyan ji hev hez kir. Evîn esle. Ii bo diya keçkeke ewropî ne girîng e zavayê wê ji çi malbatê ye, her wiha ji bo bavê xort jî ne xeme bûka wî ji çi kokê ye. Ya herî girîn ku herdu alî li hev dikin. Li vir xort/keç sîfeta rûyê malbatan wernagirin. Hin civaknas vê nakokiyan di navbera civaka me û ya Ewropiyan de bi têkliyên aborî ve girêdidin. Her ku mirov zengîn û dewlemend be, herku girêdana wî bi kes û xizmên xwe ve sist dibin. Ew bi zora pere û hebûna xwe dikane kar û barê xwe birêve bibe. Her ku mirov jar û feqîr be, her ku pêwîstiya wî bi mirovên xwe ve heye. Li vir mirov bi salan di avahiyekê de dijî û nizane ka ciranê wî kî ye û çi dike, pêwîstî tuneye.



Mebest ji van hevokan ew e ku di van du - sê salên dawî de, gelek mirovên me jin/mêrên hevdu berdane. Bi gihêştina Ewropa re ji hev dûr dikevin û yekser daxweza berdanê dikin. Li gor şopandina min, bi dehan malbat hatine berdan. Ez hin kesan dinasim hîn ew di kampa penaberiyê de ne daxweza berdanê kirine. Li gor min, koka vî êş û derdî ne li Ewropa ye. Ev reng malbat hîn li welêt di van arîşe û aloziyan de dijîn. Tenê ji ber sedemên civakî û yasayî/qanûnî yekûdu tehemûl dikirin. Li welêt mêr serdeste gotin a wî ye, qedera malbatê di destê wî de ye, bi gelemperî mêr malbatê xwedî dike, pêdivî û xerciya malê di stuyê wî de ye. Bi van ramanan mêrên me bi jin/zarokên xwe re têkildar in. Mêrin hene hîn ji civaka xwe dûr neketine, ew hîn nikanim guhertina berz û mezin bipejirînin. Li Ewropa dijîn wekî li bajarê xwe bin. Di heman demê de jin jî fêrî hin maf û qanûnan dibin. Dibînin ku yasa bi piranî li alî wan e. Zarok li ba wê dimînin, yarmetiya dewletê a zarikan ji wê re tê rêkirin. Gelek dezgeh hene ji bo wê dibin alîkar. Bi yekcarê hemû derd û êş û arîşeyên li welêt hebûn çareser dibin. Ew azad in xwedî imkan in. Ew bi yarmetiya dezgehan rewşa xwe ya diravî çareser dikin. Li vir çavdêriya civakê nemaye. Ti kes nikane bêje: Tu çima wisa dikî. Her pêdivî bi zilamekî hebe ew jin ......... ⓫

# Jina Kurd nîşana têkoşînê ye

Nazdar Hesen

Di dirêjahiya dîrokê de, rola jinê bi gelemperî di hemû warên jiyanê de hatiye mikurkirin, û ji mêran re weke pêgerekî têtê nasîn, lê ew di heman demê de jî bûye dîla peywir û kevneşopên şûndemayî, û bi hişşdfariyeke hişkdarî rola wê têtê dorpêç kirin,lewre, gelek mafên wê yên rewa hati bûn dehandin, û jê bê par ma bû .

Piraniya caran jî bi tundî û bê dadmendî hati bû îşandin û kuştin, nimûne jî pir in, yek jê, kuştina her sê xwişkên(Mîrepal) ê ên ku di sala 1960 î de bi awayekî hovane ji ber çalakiyên wan ên siyasî li ser destê rêjîma dewleta Domonîkê hati bûn kuştin. Ji ber vê yekê, di sala 1999an de, roja 25ê Mijdarê, roja têkoşîna li dijî tundiya li ser jinan, wek rojeke cîhanî hat raghandin. Bê gûman ev roja ne bû nehêl ku rêjeya tundiyê




kêm bibe,lê mixabin,ew di van salên çenga ku li Sûryê dibe de, rêjeya wê bilindtir bû, û ji kedxwerî, pêrewîtî û zorbirinê ne hat rizgarkirin û parastin, û ta weke kole di bazaran de jî hat kirîn û firotan.

Lê belê, ev kiryarên hovane yên bi şerm û pir bi êş ne bûn nehêl ku jin, û bi taybetî jina kurd têkoşîna xwe berdewam bike, û di hemû warên jiyanê de cî bigire, û di qadên şer de jî bi wan rêxistinên tundrew ve bi ser keve û bibe nîşana têkoşîna jinê, û ta cihên xwe di qadên navnetewî de bigire, mîna keça Kurd a êzîdî Nediye Mûrad a ku di Netewên Yekbûyî de bû bû paydoza niyazên rind.

Bê guman, ev hemû destkeftinên mezin, serkeftineke ji doza jina kurd re ye, ew jî netê wateya ku ew bi temamî mafê xwe sitandiye, na ew hewcedariya zagonên nûjen in, ku tê de mafê wê parastî be, ev jî bi berdewamiya têkoşîna wê pêk tê .

# ZAROK
# Û
# JIYANA BIYANÎ

Îlham Osman

Gava em dikin reftariya zarokan binirxînin, divê em li hawîrdora ku tê de perwerde dîtiye bişopîne. Dayîk, dibistana perwrdeya yekem e, li rex wê civak û dibistan jî heye.. Bêguman rewşa ku SÛRYÊ ji zêdetirî pênc salan ve tê re derbas dibe, bandoriya mezin li ser perwerde û derûniya wan hêştiye, û jiyan dijwartir bûye, û pêşeroja wan di gumaniyê de maye. Rasteqînên ku li paş kerwanên koçberiyê ne diyar in, bûyerên rojane ji kuştin, bombebarankirin, aboriya xerap, nearamî û HWD hêştiye ku jiyana wan di pêlên tevliheviyê de bimîne, û berê xwe bidin welatên biyanî. Lê metirsya mezin ku divê em lê haydar bin, perwerda ku di civaka nû û biyanî de bibînin, tevî bandoriya neyînî ku li ser kesayetiya wan navnîşanên dûrî civaka xwe yê resen binûsîne. Ev peresana jiyanî dê encamên ziyanî biafrîne, çi ji hêla dûrketina axa bav û kalan, windakirina zimanê dayîkê, û çi jî ji kevneşopiyên xwe werin şoştin.. Zarokên kurd ên ku di hembêza banka welêt de, xwenên xwe rêz dikirin, û her tişt dibû lîstoka wan weke kevir, şivik û beza wan li ser sîngê çol û mergan, di nav çar dîwaran de tên xûzkirin. Mejiyê wan di destpêkê de zagonên ......... ⓫



# Hest û Helbest

**Merwan Berekat**

**Helbestvano…!**

Eger di biryarên xwe de rindfkirî bî, di hestên xwe de azad be, yan jî helbest mîna peykerekî lihevhatî û bê can dê were ristin.

Helbestvan, siwarê xeyalê, çîkdana wateyan, hebanê zimên û xwedêwendê wêje û zelaliya hestan e.

**Wêjevano…!**

Nameya dîrokê pîroz e û naveroka wê weha dibêje: Çeka zordaran alava kuştin, talan û wêrankirinê ye, lê pir zûka zingar digre, mîna xwediyê xwe dirize û tenê gunehkarî û xwînrijandin li pey wê dimîne.

Belê… zordar pirtir ji pênûsê ditirse, lê ne ji hemû pênûsan û çendî pênûs wêrek, azad û zimantazî be, ewqas jiyana zordar û nijadperestan di keleka tirsê de dimîne.

Eger pênûs bi hêza xwe ya rast derbasî qada peyvê dibe, pir bi lez konê zordariyê tê xar û hemû xunceyên jiyanê bi rengê xwe geş dibin.

Hest û helbest, peyv û pênûs û her weha xeyal û helbestvan hevcêwî ne, ji ber wê jî, helbesta ku ji memikên hestan nemêtibe, pênûsa ku peyva wê ji malçûka tirsê be û helbestvanê ku baskên xeyala wî şikestî bin, tucarî berhema wan di jiyana miletan de pêl venadin.

Helbestvano… wêjevano.. kurdo! Bi zimanê xwe nayabdar be, yan jî nameya te ya rewşenbîrî wê pirtir û belkî jî tam, di civaka ku tu bi zimanê wê dinûsî de bijene.

Her peyveke azad, her pênûseke ne sînorkirî û her mirvekî xwedî nêrînên serbest pêşengên rastiyê ne. Ji ber wê jî, divê em pirtûkxaneya xwe ya wêjeyî ji berhemên peyvazad dewlemend bikin.

Wêjevan şewqvedan, dengvedan û vebrûsandina nazkbûna wate, hest û xeyalê ye, û her weha neynika pêşvebirina civakê ye. Ew xwediyê bêjeyên awirşaş û navnîşanên têrnîgaş e.

# Pîrozî Di Destê Mamoste De Veşartiye

**Zozan Ebdo**

Wêne bi destê wênexêz tê çêkirin, û bi destê wî û li gorî rengên ku bi kar anîne, ev wêne yan şêrîn û xweşik dibe, yan jî xirab dibe û çavan dêşîne, herwiha civak jî wêneyek e, wênexêzê wê mamoste ye, ev mamoste ku karê wî fêrkirina zarok û xwendekaran e, dibe wênesazê civakê û li gorî wî pîvana rewşa civakê an pêşketin an paşketin tê bidestxistin.

Mamoste erkek gelek buha û giran li ser milên xwe radike, û



em dikarin bêjin ku milên mamoste maka avahiya civakê ye, belê ne ji bo tiştî, tenê ji ber ku mamost zarokan perwerde dike, û ji ber ku ev zarok mîna solînên di bêxçe de, ger mamoste wan bi aveke paqij, weke ava evîna welêt av bide, û di nav axa çand û zimên de biçîne, wê ew solîn (zarok) di pêşerojê de, kengî pişkuvîn û bûn kulîlk, wê bêhna xweş di hewaya derdora xwe de belav bikin, û wê perperîkên azadiyê li dora xwe bikşînin. Lê ger mamoste, girîngiyê nede wan solînan, û têra xwe bi çend kesên di temenê xwe de bike, wê ew solîn biçilmisin, û roj ji rojê wê tova wan, ji erdê tune bibe, û bi demê re çawa ger kulîlk venebin, rûyê xwezayê sar dibe, weha jî ger zarok baş neyê perwerdekirin, li ser sinc û exlaqeke buha, li ser evîna welat, xak, erd, mirovatî û hevaltî, wê civak ne tenê sar bikeve, wê mîna avahiyeke bilind, ji hev bikeve, û bibe toz û tevlî bê bibe, pir dijwar e ku atomên wê carek din tevlî hev bibin.

Nirxandina miletekî, çi di asta zanistî de be, çi aborî, çi çalakî, çi hevsengiya pêkhateyên wê de be, bi nirxandina mamosteyên wî miletî dest pê dike. Mamoste netenê hînkerê tîpan e, …….11

**Kongirê Diwemîn ..... Dûmahîk**

Kurdistana Bakur, Si'ûdî Erebistan û ji hundirê welêt.

Pişt re, mêvanan xatir xwestin.....Endamên kongir, karê xwe berdewam kirin. Di dawiyê careke din mamoste Dilawerê Zengî hate hilbijartin ji serokatiya Yekîtiyê re û endamên Komîta rêvebir jî hatin hilbijartin.

Kongirê damezrandinê yê Y.N.K-Sûriya, di 2013 an de hate li dar xistin, yê yekemîn jî di 11/10/2014 an de bû.

Ev e deqa gotina Kovara Pirs û Weşana Newrozê ye:

**Endamên Kongir ...**

**Beşdarên bi rûmet...**

Bi me xweş e ku îro em li vî kongirê we beşdar bûne, hêvî û omîda me jî ew e ku karê we serkeftî derbas bibe, ji bo geşkirin û pêşvebirina çand û wêjeya Kurdî, hûn biryarine nirxdar û kêrhatî wergrin. Herweha, em ji we xwişk û biran hêvî dikin ku bi armanca civandina hemû nivîskarên Kurd li Sûriyê di bin yek sîwan, û navê yek saziyê de kar û xebatekê bikin, çiku wekî hûn dizanin, yekîtiya gelan, bi yekîtiya rêxistin û dezgehên wî dest pê dike.

Xwişk û birayên hêja...

Di vê dema ku gelê me yê Kurd ji bal terora cîhanî û neyarên hebûna wî, toşî êrîşên tund dibe, û li ser rêya xebat û berxwedana pîroz, ew qurbaniyên giranbuha pêşkêş dike, erk û stûbar**iya** nivîskar, hilgerên pênûsê û hemû bîrewerên civaka me ew e ku berî her tiştî, ew li hember belavkirina çanda malwêran a devavêtin, zikreşî û berberiyê serî hildin, rê li ber teng bikin, li şûna wê, çanda lihevkirin, rêzgirtin û hezkirinê di civakê de biçînin, belav bikin. Bila em hemû di wê baweriyê de bin ku belavkirina çand û ragihadina kînê di civakê de, ew di bin çi kiras, navnîşan û diruşmên netewî de be bila bibe, ew avê berdide aşê neyarên hebûna gelê me, dilê wan ê reş şa dike, û doza gelê me ya dadmend û rewa birîn dike, paş ve dide.

Herweha, ji bo avakirina cîhaneke bê sitem, bê zordestî û teror, pêwist e em çanda mirovhezî, aştî û pêkvejiyana gel û neteweyan biweşînin, nirxên aştî, azadî û wekheviyê di gotar û ragihandina xwe de bi firehî belav bikin.

Li dawiyê, bi navê Kovara PIRS û weşana NEWROZ ê, em hêviya serkeftinê ji armancên kongirê we re dubare dixwazin, û em geşbîn in ku paşeroja gelê me ronak e, ev ewrên reş û tarî, dê ji asîmanê welatê me bar bikin taromar bibin, û gelê me jî, dê serbest û azad bijî.

**Kovara "PIRS" û weşana "NEWROZ"**

17.11.2016Z-2628K

**Jinberdan … Dûmahîk**

azad e kê bîne mala xwe, nav nivîna xwe.. Ev diyarde ne tenê di nav civaka me de li Ewropa heye. Ev diyardeyeke tevahî ye. Berku hîn di nav civaka me de wisa bi ferehî rû ne daye, lê ew li ber ferehbûnê ye. Ew kesê bixweze bê Ewropa bila sed carî bi van hevokên bifikire ku min li jor nivîsandine. Ev ne di xeyala min de zîle dane. Ev ji tecrube û xwendin û şopandina min ya civakê ye.

**Zarok û … Dûmahîk**

nû qebûl nakin, lê hêdî hêdî ji zimanê ku xwe û derdora xwe naskirye winda dikin û ne dûr e ji bîr bikin, ango ev zarok di temenê ciwaniya xwe de, tu hestên netewî û hezkirina welêt pê re namîne, ev yeka xetereke mezin e, û stûnên welêt bi çûna wan tên rûxandin. Lewra ji malbatên Kurdan tên xwestin, ger li kûderê bin, zarokên xwe li ser nirxên netewî, û bi zimanê dayîkê pê re biaxivin, û di rêya saziyên ku li wir tên dîtin, wan fêrî zimanê zikmakiyê bikin, digel vejandina hiweyeta wan di werên mûzik, şano û bazdanê de. Mebes ew e ku bi hawildanên curbecurb re, tamarên hezkirina welêt, di dilê wan de biçînin, û bila di bin baskên biyanî de bimînin KURDÊN ÇIYÊ.

**Pîrozî ... Dûmahîk**

lê ew parêzerê ziman û çand e, lewma ez çiqas di nav bêwêj û hevokên xweşik de bigerim, ez û pênûsa xwe dîsa aciz dimînin, ku em peyveke li gorî hêjahiya mamoste bibînin, tenê ezê bêjim, ku her pîroziyek di nav destê mamoste de veşartiye.

# Kongirê Diwemîn ê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-Sûriya hate lidar xistin



Roja Înê,18/11/2016Z/2628K, li bajarê Qamişloyê, Hola Kongiran û bi beşdariya jimarek ji partiyên tevgera kurdî, çarçew, saziyên civaka sivîl, alavên ragihandinê, nivîskar, rewşenbîr û kesayetiyên civakî; Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Suriya, kongirê xwe yê diwemîn li dar xist.

**li despêkê b**ixêrhatina mêvanan bû, demeke bê deng li ser giyanê pakrewanên Kurd û Kurdistanê hate rawestan, paşê gotin hatin xwendin.....

1- Gotina Desteya Çand û **H**huner li kantona Cezîrê, ji bal Seroka **desteyê mamoste Bêrîvan Xalid**.

2- Gotina Yekîtiya Nivîskarên Kurd- Suriya û mamoste Dilawerê Zengî, serokê yekîtiyê .

3- Gotina Kovara Pirs û weşana Newroz , û mamoste Newafê Bişar.

4- Hevgirtina Nivîskar û Rewşenbîrên Kurd li Ewropa û mamoste Ehmed Huseynî.

5- Gotina Yekîtiya Rewşenbîrên Kantona Cezîrê û mamoste Xalis Misewer.

6- Gotina Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana sûriya (Rêya Rast) û mamoste Bextreşê Koçer.

7- Gotina Tevgera Civaka Dimokratîk (TEV-DEM) û mamoste E**bdiss**elam Ehmed.

8-Gotina Partiya Dîmokrat a Pêşverû li Sûriya û mamoste Hesen Cengo endamê **Nivîsgeha** Rêzanî.

Hêjayî gotinê ye ku 110 birûskên pîrozbahiyê gihiştine kongir ji Ewrupa, Emerîka, Kurdistana başûr, ................. ⓫

# Pîrozname



**Ji kongira rêxistina navçeya Kobaniyê re …..**

**Beşdarên birêz ……..**

**Hevalên hêja ………**

**Silav ji we hemiyan re …….**

Pêşî, pêwîste bête gotin ku, çendî lidarxistina kongirekî weha pîroz e, ewqas jî ciyê berpirsiyartiyê ye, ji ber ku, di qonax û mercên weha de, xebata we ya rojane, bona birêxistinkirina kar û bar, pêwîstî û pêdiviyeke dîrokî û zor girîng e.

**Hevalên cefakêş …….**

Di van şeş salên borî de, hûn û derdor baş dizanin ku, çendî helwest û siyaseta partiya we di derbarey kirîza Sûriyê de, ciyê rêzgirtinê û pîvayî bû ….. Herweha, ji xwînrawestin û şêweya diyalogê bona peydakirina çareseriyeke siyasî aştiyane pê ve, me ti rê ne dîbû, bawerî li cî ye ku, îro jî em nabînin.

Metirsiya herî mezin û nakokiya herî sereke. Tund û tûjiya pirojeyên Îslamî siyasî, û di serî de rêxistinên Da´îş û Cebhit Elnusra û hevalbendên wan e, lewre jî, berxwedan û têkoşîna li beramber van hêzên hovane, nijadperest û nemirovane, erkeke lidar û berdewam e.

Bêguman Kobanî, li seranserî Sûriyê û cîhanê bû ye sembola li dijî terorîzmê, sembola berxwedan û fedekariya yekîniyên parastina gel YPG - YPJ yên ku, ji hemî Kurdan re bûne hêz û sermiyan.

Bawerî li cî ye ku, rol û xebata kadro, heval û hogirên partiya we, her dê di xizmet parastin û berjewendiya gelê me yê Kurd de be, di xizmet lihevkirin, pêkvejiyan, Aştî, Azadî û Wekheviyê de be.

•*Serkeftin ji kongira we re.*

•*Silav û rêz ji ji xelkê me yê Kobanê re.*

*Efrîn 22.12.2016*

**Hevalê we**

**Mihyedîn Şêx Allî**

**Sekretêrê partiya yekîtî ya demokrat a Kurd li Sûriyê**

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de**

Êmêla Newrozê:
Newroz@yek-dem.com